

Henano ye!

- Cî û warê Îsma'îl Umer li ba Dr.Qasimlo, Şerefkendî, Samî Ebdirehman û Mele Mustefa Berzanî ye!

-Cî û warê Îsma'îl Umer li ba Mûsa Enter, Fayiq Bocaq û Se'id Alçî ye!

-Cî û warê Îsma'îl Umer li ba Hemze Niwêran, Cegerxwîn, Osman Sebrî û Dr. Nûredîn Zaza ye!

-Cî û warê Îsma'îl Umer li ba Ebdilhemîd Zîbar, Ebdirehman Osman û Dr.Newaf Husên e!

Soz û peyman, em dê li ser riya dilsozî û hişmendiya nemir mamoste Îsma'îl Umer berdewam bin û bixebitin.

Careke dî, bi navê Komîta birêvebir ya parta Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê, em serê we hemiyan sax dikin, bila hûn xweş bin , dost, heval û hogirên Îsma'îl Umer sax bin, xelkê Qereqoyê, parêzgeha Hesîça û gelê Sûrî xweş be. Merivên heval Îsma'îl, keç û lawên wî sax bin.

Sipas ji guhdariya we re.

19.10.2010Z

Têbîn:

Hêjayî gotinê ye ku, gotinek bi zimanê Erebi jî, ji bo birayên me Erebi jî, ji hîla sekretêrê partiya me ve hate xwendin.

Gotina xwediyar ji hêla kurapê bavê Şiyar birêz Umer Umer ve hate pêşkêşkirin. Vaye hin perçeyên bijarte ji deqê (... Ey bira û xwîşkino! . Bi nave malbata nemir, em beşdariya we sipasdikin ... Beşdariya we nîşana hezkirina we ji nemir bavê Şiya re ye...Heweha hevpişkiya we ji êşa me re, nîşana hesta we ji dozên hevpişk di navbêna me de ye...Li dawiyê ez li we dirêj nekim, ez jî serê we û hevalê wî sax dikim.

Kurtejiyana maoste Isma'îl Umer

Sala 1947an, li gundê Qereqoyê- ya girêdayî bajarê Dirbêsiyê -ew ji diya xwe re bûye.

Sala 1953an, li dibistana gundê xwe, dest bi xwendina seretayî dike û sala 1958an wê qonaxê diqedîne.

Piştî wê, bi armanca xwendina navîn, ew diçe bajarê Dirbêsiyê ku derdora 15 km an ji gundê wan dûr e û sala 1965an bekalorya kuta dike û li Zanîngeha Şamê dibe xwendekarê

beşa Xaknîgariyê û sala

1969an, xwendina Zanîngehê jî diqedîne.

Sala 1970, dice leşkeriya welatê xwe Sûriyê û di şerê



Oktoberê sala 1973an de beşdar dibe, di wî şerî de, ew li nik efserên xwe yên mezin, bi mîrxasî û gernasîya xwe dibe nimûneyeke balkêş.

Sala 1963an, di Partî de dibe endam û dest bi xebata netewî dike. Dema li sala 1965an, yekemîn parçebûn li Partî dest da, mamoste dibe alîgirê Çep. Sala 1975an, ji leşkeriyê vedigere, careke din di Partî de, dibe endamê komîta heremê û sala 1983an, dibe endamê komîta navendî û di nivîsgeha rêzanî de bi çalakî dixebite.

Sala 1988an, ew digel çend hevalan dev ji Partî berdide û sala 1989an kongirekî li dar dixê. Di Tîrmeha sala 1990î de, digel hevalê partiya Çep û partiya Kar, kongirekî yekîtiyê li dar dixê û partiya Yebûyî dadimezrîne û mamoste Isma'îl dibe sekreterê partiyê. Li ser riya yekîtiyê, careke din, sala 1993an, yekîtiyekê di navbera parta Yekbûyî, Pale û Hevgirtia Gel de li dar dixê û partiyeke nû bi navê Pariya Yekîtiya Demokrat a Kurd Sûriyê(YEKÎTÎ) dadimezrîne û birêz Isma'îl Umer dibe sekreterê wê. Ji sala 2001ê ve, weke serokê partiyê, di kongir de tête hîlbijartin.

Birêz Isma'îl Umer, bavê sê kur (Şiyar, Bengîn, Sîpan) û keçekê(Rojîn) ye.

Xwedayê mezin wî bi dilovaniya xwe şa bike û wî di buhuştê de cîwar bike.